

# LÊNÊRÎNA RAST BIBÎNE

? Heke pirsên te li ser laş û zayendîtiyê hebin?  
Tu dikarî gelek alîkariyê wergirî. !

1. Li beşa ku pirsên te li ser hene binêre.
2. Hejmara di danasînê de nîşan dide ku tu dikarî ji ku alîkariyê bistînî.
3. Numre di bin hûrguliyê Têkiliyan de bibîne.  
Li ser tekstê bitikîne da ku tu biçî malperê  
û wextekî veqetînî!


**Testkirina ji bo nexweşiyêن cinsî û HIVê**  
Heke tu bî kesên din re seksê neparastî bikî, tu dikarî bi nexweşiyek zayendî (STI) bikevî. Gelek nexweşiyêن ku ji aliyê zayendî ve têne veguheztin li ser laş nayêن hîskirin û dîtin. Ji bo ku tu bizañ ka te HIV an STI-yeñ din heye, divê tu xwe test bikî. Test û dermankirin gelek caran belaş e.




## Xweparastina avisiyê - heke tu nexwazî ducanî bibî

Mafê te heye ku tu bixwe hilbijêri ka tu dixwazî bibî xwedî zarok an na û heke wisa be, kengî. Dema tu nexwazî zarokê bîn hingî tu dikarî pêşîlégirtina avisiyê bi kar bînî. Çend awayen xweparastina hene û mafê te heye ku tu şîret û alîkariyê belaş bistînî, da ku tu ya li gorî xwe peyda bikî.

2 4 6 7 8



Hebên pêşîlégirtina avisiyê, spîral, kondom û p-darik




Kondom yekane rîgiriya ducaniyê ye  
ku hem li hember ducaniyê hem jî ji  
nexweşiyêن de rîya zayendî re diparêze.

## Kontrolêن ji bo tespîtkirina penceşêrê (kanserê)

**Muayenaya prostatê:** Prostat li dora mîzokê ye. Penceşêra prostatê pir gelempirî ye. Penceşêra prostatê dibe sedem ku mirov bêtir dimîze, mîz qelstir tê, an jî di nav mîzê de xwîn tê. Xetera peydabûna penceşêra prostatê her ku mirov kal dibe, zêdetir dibe. Ger tu dixwazî xwe kontrol bikî, serî li navendek tenduristiye bide. 2



**Testgirtina şaneyê:** Testa hucreyê tê girtin da ku kansera di devoka malzarokê de zûtir were tespîtkirin. Heke tu jin i (An jî hejmara te ya şexsî ya jinan e) û jî 23 salan mezintir bî, dê bi rîkûpêk jî bo testa hucreyê gazî te were kiran. Wê nameyek jî te re bête şandin. Kontrol belaş e. 6 7



**Kontrolêن pêşîrê:** Kontrolkirina memikan jê re mamografi tê gotin. Ew jî bo zû tespîtkirina kansera memikan tê kirin. Ger tu jin i (An jî hejmara te ya şexsî ya jinan e) û jî 40 salî zêdetir bî, bi rîkûpêk jî bo kontrolkirina pêşîrê tu ê bêyî gazîkirin. Tu ê nameyek vexwendinê bistînî. Kontrol belaş e. 2 16

## TENDURISTIYA CINSÎ

### Meyla cinsî

Ma tu ji kesên ji heman zayendê hez dîkî û bala te diçê ser mîran an jî jinan? Li gora qanûnê Swêdê mafê te heye tu ji kê hez bikî an jî bi kê re bimînî.

4 5 17 22

### Nasnameya cinsî û trans

Ma fikra te li ser nasnameya trans û zayendî heye? Ma tu difikirî ku tu ji ci zayendî yî: nîr, mîr, an ne-binary? Tu dikarî bi telefonê piştgirî û alîkariyê bistînî. 4 21 23

Her weha tu dikarî bi navgîna rîxistinê cihêring bi mirovîn din ên mîna xwe re hevdîtinê pêk bînî. 22 23 24

Lênêrîna tenduristiye dikare lêkolînê bike ka tu dikarî dermankirin heye. Wek mînak, alîkariya da ku laşê te bi zayenda ku tu his dîkî an jî dizanî ku tu yî li hev bikin. 18

### Organê cinsî dişewite an diêše

Heger di organê cinsî de êş an şewitîn hebe, girîng e ku were kontrolkirin û were zanîn ka sedema nerehetiyê ci ye. Herweha bila testa nexweşiyen cinsî jî di bala te de be. 2 4 6 7 8

### Di dema seksê de êş

Divê seks neêşîne. Lîbelê gelek hene ku êşê hîs dîkin. Divê tenê gava ku tu bixwazî û heke tu xwe baş his bîkî seksê bikî. Ger di dema seksê de biêše, girîng e ku meriv alîkariya dermîn wergire. 2 4 5 6 7 8 11 17

### Gava bi zehmetî rep dibe

Hema hema yê her kesî di hin deman de ranabe û rep nabe. Ew bi gelempirî jî ber ku mirov dilnerehet e an jî bi stres e. Sedem ci dibe bila bibe, mafê te heye tu alîkariyê wergirî. 2 4 17 21

### Gava zû ji mirov diçê


Ma tu bi endişeyî ku zû ji te diçê? Valabûna pêşwext gelempirî ye. Heke tu difikirî ku ew problemek e, gengaz e ku tu derengkirina valabûnê pratîk bikî. 2 4 5 17 21

### Sinetkirina kîr an quz

Ma kesekî organa te ya zayendî bîriye an jê kîriye? Ka bê bi ci awayî bûye, dibe ku problemen cûda hebin. Tu dikarî hem ji bo problemen laşî û hem jî yêñ psîkolojîk alîkariyê bistînî.

2 4 5 7 13 14



Quz



### Têkiliyên bi vajînaya te re

Ma tu ditîrsî ku te bêyî dilê te bidin yekî, an jî bi zorê û bêyî daxwaza te te mecbûrî têkiliyekê bikin? Di rewşen wiha de rayedar û rîxistin hene ku ji bo alîkariyê dixebeitin.

4 5 17 19 20 25 26 27



### Ketina cilan

Ger di dema ketina cilan de tu pîr êşê bikişînî, pir xwîn were, an jî xwe di wê derbarê de xemgîn his bîkî, tu dikarî alîkariyê wergirî.

2 4 5 6 7



### Seka bêyî daxwaza te an jî şideta seksî

Heke bi zorê mirov hewceyî kirina tiştekî seksî bibe bêqanûnî ye. Heke hevjinê te jî bike dîsa bêqanûnî ye. Heke tu büyî qurbaniya destavêtinê, baş e ku tu zûtirin dem têkliliya klînika acîlê bikî. Her weha baş e ku meriv piştî demek dirêj jî li alîkariyê bigere.

3 4 5 11 17 19 20 21 25 26 27

### Kêmbûna daxwaza seksê

Daxwaza seksê, yanî daxwaza kirina seksê ji bo her kesî cihê ye. Heke tu di derbarê daxwaza xwe ya seksê de bi xem bî tu dikarî alîkariyê wergirî û bi hinan re bipeyiî.

2 4 5 6 17 21 27

### Daxwaza seksî ya ne dilxwaz

Ma tu li ser fikirê xwe yên seksî ne rehetî? Wek mînak, heke tu li ser şideta cinsî an jî daxwaza seksa bi zarakan re xeyalan dikî. U tu ditîrsî ku tu ê wan fantaziya pek binî û zerarê bidî hinan, tu dikarî hingî piştgirî û alîkariyê wergirî. 4 8 17 21 27 29



### Daxwaza bihemilbûnê

Heger bihemilbun bi zorî ye, tu dikarî alîkariyê wergirî. Li Swêdê mafê kesên bi tenê ên tedawiyê heye. Hevjinê ku du jin an mîrek û jinek jî dikarin alîkariyê wergirin. Herweha mirovîn trans jî dikarin alîkariyê wergirin. 2 7 15

### Naxwaze ducanî bimîne

Heger tu bihemil bî lê edî naxwazî, mafê te yê kurtajê heye. Hertim jina avis biryarê dide ku ew dixwaze zarokê jî ber xwe bike an na. Li Swêdê heta heftiya 18an mafê herkesî heye ku kurtajê bike. Paşê sedemên taybetî hewze ne. Zûtirin wext têkiliya navendek tenduristiye bike. 4 6 7 12

### Tu bihemil û zarokê dixwazî

Divê tu bi rîkûpêk biçî kontrolan û bibînî ku tu û zarok baş in. Dersen dêûbavtiyê jî hene ku tu û hevjinêk xwe dikarin jî bo amadehiyê biçin. 6

### Tu ê zarokê bînî

Nîşanên ku zayîn destpêkiriye, ewin êş li ser hev tê û ava çêbûna zarokê berdaye. Telefonî nexweşaneyê, klînika jidayibûnê bike. Ew ê ji te re bibêjin ka kengî divê tu biçî nexweşanê. 10

### Problema piştî çêbûna zarokê

Piştî çêbûna zarokê hin dişin, hin jî xwe baş his nakin. Tu dikarî alîkariyê wergirî. 2 6 7 11

## Hejmarêñ telefonan ên girîng:

SOS Alarm ji bo alîkariya acîl (ambulans): 112  
Şîret li ser lénérînê û tenduristiyê (ne lezgîn): 1177 ①

## Girîng e ku mirov bizanibe

### Mafêñ tenduristiyê

Mafê te heye ku tu bi xwe hilbijêrî kîjan navenda tenduristiyê tu dixwazi biçiyê. Girîng e ku tu xwe qeyd bikî û navenda lénihêrîna tenduristiyê hilbijêrî. Ger nasnameya te ya bankê, Bank-ID, hebe, tu dikarî bi servîsên elektronîkî li ser 1177 wextekî bi klînîkên cihêreg re vejetînî.

### Lénérîna seretayî

Lénérîna seretayî ew cih e ku gava tu cara pêşî nexweş dikevî tu ê li wir bigerî. Tu dikarî her gav ji bo şêwirdariyê telefonî 1177 ① bikî. Lénérîna seretayî ji navendêñ tenduristiyê ② pêk tê, ku ji bo pirsgirêkîn tenduristiyê yên ku ne lezgîn in alîkariyê dikin. Heke nexweşîya te giran be, divê tu telefonî 112 bikî an jî biçî beşa acîl li nexweşxaneyî.

### Sirveşartinê

Herkesê ku di lénihêrîna tenduristiyê de dixebeit, xwedî erka sirveşartinê ye. Ev tê wê maneyê ku divê ew ji kesî re nebêjin (mînak polîs, Daîreya Koçê an kesêñ din) ku tu çûyî wir.

### Wergêr

Heger tu swêdî nizanî, mafê te yê wergêr heye. Ji me re bêje dema tu seredana xwe vejetînî ku tu hewcîyî wergêrekî yî. Heger peşwext wergêr ne veneqetandiye, xebatkarêñ tenduristiyê dikarin li navenda wergêrîyê bigerin û wergêr li ser telefonê bixwazin.

### Penaber û kesêñ bê belge

Hemû zarok û ciwanêñ di bin 18 salî re li Swêdê xwedî mafê lénérîna tenduristî û lénérîna diranan in. Heger temenê te ji 18 salî zêdetir be, mafê te heye ku "lénérînê ku divê bê kirin" bikî tevî ku hejmara şexsî tune be. Ew ji lénihêrîna acîl wêdetir e. Di dema ducaniyê û welidinê de jî lénérînê, kurtaj û şîretên pêşîlegirtinê hene. Ew personelê lénihêrîna tenduristiyê ye ku dinirxîne ka tu hewcîyî lénérînê yî an na.

– Karta LMA. Dema tu li Swêdê serlêdana penaberiyê dikî, tu pêşî ji bo serlêdana xwe meqbûza xwe distînî û paşê ji Daîreya Penaberiyê karta LMA distînî. Karta LMA an jî meqbûze bi kar bîne da tu lénérînê tomor bikî an dermanan bistînî.

– Hejmara Reservasyonê. Dema tu li Swêdê bê kaxez, hiwîyet u bêyi hejmara shexsi bî, tu wê hejmarek ihtiyyatî bistînî. Ew hejmara ihtiyyatî bi tenê di navenden tenduristiyê de dixebeit. Her gava ku tu lénérînê distînî hewl bide ku tu eynî hejmara ihtiyyati bi kar bîni.

### Xercêñ nexweşan

Dema tu serdana lénérînê dikî bi gelempêrî divê tu xercekî bidî. Serdanêñ jinêñ ducanî yêñ klînîkê belaş in. Kontrolêñ ji bo kansera pêşîrê (mamografiya) û devoka malzarokê (cellprovtagning) belaş in. Testkirin û dermarkirina piraniya nexweşîyan cinsî belaş in.



Li vir agahdarî heye ku tu dikarî di derbarê pirsên xwe de bi kî re têkiliyê deynî. Li ser tekstê bitikîne da tu biçî malperê û wextekî vejetîne!

## Agahiyêñ têkiliyan

- 1 **1177** Şîret li ser lénérînê û tenduristiyê. Şev û roj vekirîye. Heke tu nebawerî ku tu kengî û li ku alîkariyê wê wergîrî, tu dikarî hingî li malpera 1177.se binêrî an jî telefonî 1177 bikî. Hingî hemşîre dê alîkariya te bike û bersiva pirsên te bide. Agahdarî bi swêdîya hêsan û bi zimanêñ cuda hene.
- 2 **Navenda Tenduristiyê (Vårdcentral)** alîkariya te dike bi her tiştê ku bi tenduristî û nexweşiyê ve girêdayî. Heger hewcedariya te bi lénérînek din hebe, doktor hingî herweha wê alîkariya te bike. Navendêñ tenduristiyê ji bo her kesî ne, bêyî ferqa temen. Tu dihilbijêrî ku kîjan navenda tenduristiyê tu dixwazî biçiyê.
- 3 **Beşa acîlê (Akutmottagning)** ger qezayek giran an nexweşiyek giran ji nişka ve hebe. Beşa acîlê li nexweşxaneyekî ye û ew her dem vekirî ye, bi şev û roj. Heger tu nebawerî nexweşîya te çiqas giran an ji heger divê tu biçî navenda tenduristiyê an beşa acîl, telefonî 1177 ① bike.
- 4 **Pêşwaziya ciwanan (UMO)** ji bo te ku ciwan e. Li vir tu dikarî ji bo pêşîlegirtina ducaniyê, ceribandinê û heke pirsên te li ser laş, zayend, têkilî û hestan hebin, tu dikarî belaş alîkariyê wergîrî.
- 5 **Tenduristiya şagirtan (Elevhälsta)** Li dibistana te kesêñ ku ji bo tu xwe baş hîs bikî dixebeitin hene. Heke tu bi fîkarî, bi stres an xemgîn i an jî xewa xwe nastînî, tu dikarî piştgirîyê bistînî. Her weha tu dikarî bersiva pirsên li ser laşê xwe an li ser seksê jî bistînî. Ew her gav belaş e û tu pir caran dikarî di dema dersê de biçî wir.
- 6 **Klînîka pîrikê (Barnmorskemottagning)** herweha dikare bi navê Navenda Lénihêrîna Dayikbûnê (MVC) be. Ew di dema ducaniyê û pişî ducaniyê de dibin alîkar û berî ku bibin dêûbab piştgirîyê didin. Ew şîretan li ser rîgirtina ji ducaniyê dikin, ji bo nexweşîyan ku di rîya cinsî re derbas dibin diceribînin û testa hicreyan dikin.
- 7 **Klînîka Jineolojîyê (Gynekologmottagning)** Li vir tu dikarî ji bo pirsgirêkîn vajînayî, malzarokê û ducaniyê alîkariya pisporî bistînî. Ji bo vejetandina wextekî, sewqek ji navendek tenduristiyê an jî xwe-seferandinê hewce ye.
- 8 **Wergirtina STI (STI-mottagning)** Li vir tu dikarî ji bo nexweşîyan di rîya seksê/STI û HIV-ê de xwe test bikî û li ser rîgezîn ducaniyê şîretan wergîrî, penîs an vajîna xwe kontrol bikî, testa ducaniyê bikî, an jî ji bo mijarêñ girêdayî seks û têkiliyân şîret û alîkariyê wergîrî. Meriv dikare jê re pêşwaziya laş û cinsî jî bibêje.
- 9 **Klamydia.se** Testa belaş a klamidia û gonorreÿe ku tu dikarî li maleş bikî. Li piraniya herêman peyda dibe.

# 1177

## Rêkxistinêñ piştgirî û alîkariyê

- 10 **Wargeha jidayikbûnê (Förlossningsavdelning)** Bi gelempêrî li nexweşxaneyekî ye û 24 demjimêran vekirî ye. Li klînîka jidayikbûnê ew te agahdar dike ka kîjan besêñ jidayikbûnê li nêzî te hene û jî te re dibin alîkar ku tu yekê hilbijêrî.
- 11 **Beşa acîlê a Jineolojîyê (Akutmottagning gynekologi)** Jê re Beşa Jineolojîyê jî tê gotin (Gynakuten). Alîkarî, di nav tiştîn din de, betalbûn, xwînrijîna giran ji vajînayê û lénihêrîna pişî istîsmara zayendi. Her weha ji bo kesêñ bihemil an jî nû zaro anîne û hewce ne ku di heman rojê de biçin ba doktor.
- 12 **Klînîka kurtajê (Abortmottagning)** Li vir tu dikarî alîkariya zarokjiberxwegirtinê wergîrî, herweha alîkariya berî û pişîtê girtina zaroê jî wergîrî.
- 13 **Amelmottagningen li Södersjukhuset (Stockholm)** Ger pirsgirêkîn te ji ber sinetkirin/senetkirina organen zayendî hebin tu dikarî piştgirî, agahdarî û lénérînê bistînî. Tel: 08-123 627 00. Navnîşan: Sjukhusbacken 10, Stockholm.
- 14 **Klînîka quzî li Angered's Närsjukhus (Vulvamottagningen) (Goteborg)** Ger pirsgirêkîn te ji ber sinetkirin/senetkirina organen zayendî hebin tu dikarî piştgirî, agahdarî û lénérînê bistînî. Tel: 031-332 69 02, 031-332 67 00. Navnîşan: Halmstorget 1, Angered.
- 15 **Klînîk dermanê zayînê (Reproduktionsmedicinsk mottagning)** Ji bo kesêñ ku ji bo ducanîbûnê hewcîyî alîkariyê ne.
- 16 **Resepsiyona mamografiyê (Mammografimottagning)** Li vir tu dikarî kontrola pêşîran bikî ji bo zû tesbîtkirina kanserê.
- 17 **Pêşwaziya mîran (Mansmottagning)** Ji bo te ku mîr e. Li vir tu dikarî ji bo pêşîlegirtin, ceribandin û heke pirsên te li ser laş, zayend, têkilî û hestan hebin, alîkariyê wergîrî. Li hin deverêñ welêt peyda dibe.
- 18 **Klînîka disforiya zayendî (Kônsdysforimottagning)** Heke tu dixwazî laşê te bêtir li gorî nasnameya zayenda te be. Ew dikarin lêkolînekê bikin. Paşê tu dikarî alîkariya (hormon û emelyatê) wergîrî.
- 19 **Xizmetêñ Civakî (Socialtjänst)** Xizmetêñ civakî dikarin piştgirî an alîkariyê bidin te. Wek mînak, heke kesin din bixwazin têkiliyên te an zayenda te kontrol bike. Tu hingî dikarî ji şaredariya xwe re telefonê bikî û bixwazî bi karûbarêñ civakî an jî rewşa awarte ya civakî ve werî girêdan.
- 20 **Polis (Polis)** Tu dikarî ji polis alîkarî û piştgirîyê wergîrî. Bo nimûne, heke zîlma cinsî an jî namûsê li ser te hebe. Her weha girîng e ku tu li ba polis gîlî bikî. Hejmara telefona polis: 114 14. Di rewşa awarte yan jî tawanek berdewam de, telefon bikin: 112.
- 21 **RFSU** Li rfsu.se/upos tu dikarî bi zimanêñ cuda filmêñ enformasyonê bibîn. RFSU di heman demê de têkiliyek online jî heye. Şêwîrmendiya bi telefonê jî li klînîka RFSU heye. Tu dikarî bi pîrikekî re li ser tel: 08-692 07 84 biaxivî. Tu dikarî bi psikoterapistê re li ser tel: 08-692 07 70 biaxivî.
- 22 **Komeleya RFSL** ji bo mafê homoseksuel, bîsekuel, mirovîn trans, queer û intersek e. **Nûhatiyen RFSL (RFSL Newcomers)** Ji bo û bi penaberîwaz, kesêñ nûhatî û hbtqi ên bê belge. **RFSL Newcomers Youth** Ji bo û bi penaberîwaz, û hbtqi ên bê belge yên di navbera 15-30 salî de.
- 23 **Transammans.se** Piştgirî û hevkarî ji bo kesêñ trans û xizmîn wan. Email: hej@transammans.se. Transammans li ser Facebookê jî heye.
- 24 **FPES, Komeleya Transan** Agahiyêñ pêwendiyê li ser malpera fpes.se/kontakt hene.
- 25 **Xeta Azadiyê ya Jinan (Kvinnofridslinjen)** Ger tu keç/jin bî û tûşî şîdetê hatiyî. Tu dikarî piştgirî û alîkariyê bistînî bê ka divê tu serî li ku bidî. Tu dikarî bi riya wergêrekî alîkariyê wergîrî. Telefon: 020-50 50 50.
- 26 **Navenda Piştgiriya Somaya (Somaya stödjour)** Ji bo te ku jin/keç an jî HBTQI yî û tûşî şîdet, tehdîd û kontrolê têyî. Bi tevahî nihînî û bi zimanêñ cuda. Wan sohbetek online jî heye. Tel: 020-81 82 83. E-mail: stodjouren@somaya.se.
- 27 **Killar.se** Ji bo te yê ku xwe wek mîr didî nasîn û 15-25 salî ye. Tu dikarî bi şêwîrmendek re biaxivî an jî nenas bide û bistîne. Hemû pirs û raman bi xêr bêñ. Email ji bo wergirtina bangê: mottagning@killar.se. Telefon: 076-265 32 65
- 28 **Qedandin hilbijêre (Väli att sluta)** Ji bo kesêñ ku rîska zerarê didin yê ku jê hez dike û ji bo kesêñ ku rastî şîdetê têñ. Bi tevahî nenas. Telefon: 020-555 666.
- 29 **Preventell.se** Heke tu hest dikî ku te kontrola li ser zayendiya xwe winda kiriye an tu ditîrsî ku zirarê bidî xwe an yêñ din. Bi tevahî nenas. Telefon: 020-66 77 88.
- 30 **Xaça Sor (Röda korset)** Heger pêwîstiya te bi lénérînê hebe, lê destûra mayîna li Swêdê tunebe, Xaça Sor dikare alîkarî û piştgirîyê bide te ku bi lénérînê re têkiliyê deynî û alîkariyê wergîrî. Telefon: 020-211 000. Sms: 0723-49 98 08 E-post: papperslos@redcross.se

